

## BOOK REVIEW / NIRXANDINA PIRTÛKAN

### MELAYÊ CİZİRÎ SEVGİ VE GÜZELLİĞİN ŞAİRİ

Halid Cemil Muhammed, Wergera ji Erebî bo Tirkî: Ümit Demirhan, 2008, İstanbul: Weşanên Hîvda, Çapa yekem. 273 rûpel, Isbn: 3990000086542.

Nevzat EMİNOĞLU\*

**Article Type:** Book Review // Nirxandina Pirtûkan  
**Received** // Hatın: 14/11/2020  
**Accepted** // Pejirandin: 15/11/2020  
**Published** // Weşandin: 30.11.2020  
**Pages** // Rûpel: 133-137

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).  
<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



**Citation/Atîf:** Eminoglu, Nevzat, (2020). "Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğın Şairi, *Kurdiname*, no. 3, p. 133-137.

Ev pirtûk ji aliyê Halid Cemil Muhammed ve hatiye nivîsîn û di sala 2008an de ji aliyê Ümit Demirhan ve ji Erebî bo zimanê Tirkî hatiye wergerandin. Pirtûk 273 rûpel e û ji meqaleyekê, pêşgotinekê, pênc beşên sereke û çavkaniyan pêk tê. Ji weşanxaneya Hîvdayê derketiye. Navê kitêbê yê resen bi Erebî "Cizîrî Şairu'l Hubb û Wel Cemal" e. Ev nav wek "Sevgi ve Güzelliğın Şairi" hatiye wergerandin.

Meqaleya ku di serê kitêbê de hatiye nivîsîn a Ferhad Şakelî ye derbarê helebista Cizîrî de. Sernav "Melayê Cizîrî'nin Şiirinin Estetik Boyutları" (Buûden Estetik ên Helbesta Melayê Cizîrî) ye. Ev meqale bi Îngilizî hatiye nivîsîn û Ayet Aram ji Îngilizî wergerandiye bo Tirkî. Pêşgotineke kurt heye û derbarê kêmasiyên elfabeya Erebî de ye û zêde bi mijara kitêbê re eleqeya wê tuneye. Her pênc beşên sereke yê ku temaya kitêbê pêk tînin ev in: Beşa yekem di bin sernavê "Cizîrî'nin Şiir İklimine Dair" de behs ji nîqaşên dîroka jidayîkbûna Cizîrî û taybetiyên helbesta wî dike. Di beşa duyem de di bin sernavê "Sevgi/Evîn"ê de 12 binbeşên cuda yê bi evîne re têkildar, îzah dike.

Di beşa sêyem de di bin sernavê "Güzellik/Spehîti-Rindî"yê de 4 binbeşên cuda yê bi spehîtiyê re têkildar, îzah dike. Di beşa çarem de di bin sernavê "Sarhoşluk/Mestî- Serxwoşî"yê de 3 binbeşên cuda yê bi mestbûnê re têkildar, îzah dike. Di beşa pêncem de ku beşa dawî ye, di bin sernavê "Bilgi ve Sevgi-Güzellik-Sarhoşluk Üçgeni/Sêgoşeya Zanîn û Evîn-Spehîti-Mestiyê" de peywendîya van têgehên a bi hevdu re, rave dike.

Şakelî di serê meqaleya xwe de derbarê jidayîkbûn, mexles û berhemên Melayê Cizîrî de hin agahîyan dide. Ew, dîroka ku Zivingî ji hesabê ebcêde ya ji beytên Mela û Feqî derdixe wek (1570-1640) maqûl dibîne. Paşê derheqê rewşa siyâsî ya Mîrekiya Cizîra Botan de hin agahîyan dide û tîkiliya Cizîrî û Mîr Şeref Xanê Cizîrî yê III. tîne ziman ku muxatabê her du medhiyeyên Cizîrî ev mîr e. Şakelî paşê behsa zimanê Cizîrî yê alegorîk dike û bi mînakên ji beytên Cizîrî, hunerên edebî yê metaforîk şerh dike. Dibêje ku Cizîrî bi rêya wan mazmûnên

\*Öğr. Gör., Muş Alparslan Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, n.eminoglu@alparslan.edu.tr, Orcid: <http://orcid.org/0000-0002-4980-7556>.

edebî ku zahiren behsa mehbûbên însanî dikin, qesda mewcûdeke meçhûl dike. Paşê tehlîla zimanê Cizîrî yê bi Kurdiya Kurmancîyê dike û dibêje: “Qesîde û xezelên Cizîrî, bîr û baweriya wî ya mîstîk û felsefî tînin ziman.” Pênc heb çavkaniyên vê meqaleya di serê kitêbê de hene.

Pêşgotin, a muelifê pirtûkê Halid Cemil Muhammed e. Pêşgotineke kurt e û derbarê kêmasiyên elfabeya Erebi de ye. Dibêje ku elfabeya Erebi hemû dengên Kurdî îfade nake. Loma elfabeya Latîni bêhtir li zimanê Kurdî tê. Ji ber wê ye ku piraniya Kurdan bi heqdarî elfabeya Latîni bi kar tînin. Ew di dawîya pêşgotinê de dibêje ku ez gava li bajarekî Sûriyeyê yê bi navê Helebê, li Zanîngeha Helebê, di Fakulteya Edebiyatê û Beşa Zimanê Erebi de xwendekar bûm, min dest bi nivîsîna vê kitêbê kiriye. Her wisa dibêje ku ev xebat ne di wê îddiyê de ye ku hemû bersivên derbarê Cizîrî de bibersivîne. Dibêje ku min di dema xebata li ser vê pirtûkê de ji şerha dîwana Cizîrî ya Mela Ehmedê Zivingî û dîsa ji şerha Mela Evdiselamê Cizîrî îstifade kiriye û gotinên min ên muxalifê wan qîmeta îzahatên wan naxîne.

**Di beşa yekem a** kitêbê de nivîskar bi awayekî gelemperî, behsa jîyan û rewşa helbesta Cizîrî dike. Ji van her du mijaran berê behsa helbesta Cizîrî dike û taybetiyên helbestên wî tîne ziman. Dixwaze cihê wî yê di edebiyata Kurdî de rave bike. Di vê bareyê de dibêje ku nav û kesayetên edebiyata Kurdî yên wek Feqiyê Teyran, Macîn, Ehmedê Xanî, Sîyahpoş, Nalî, Mîna û wd. nekarîne bigihêjin Cizîrî. Nivîskar dibêje ku Cizîrî di dîwana xwe de bi awayekî heqdar pesnê xwe daye û ev yek bi dereceya eserên xwe jî nîşan daye. Lewma em jî wê rastiyê tînin ziman. Ev nayê wê maneyê ku em, pêşeng û filozofên tesewufa Îslamê yên wek Îbnî Farid piçûk dibînin. Armanca vê kitêbê ew e ku hema kêma be jî, esera yek ji wan kesên pispor û hostayên şîra Kurdî bide nasîn.

Li gor nivîskar, Cizîrî rêya aqilî ya ji bo bawerî û merîfeta heqîqî, kafî nedîtiye û ew piçûk nirxandîye û rêya ruh û qelbî esas girtiye û her wisa di alema ruhî de zanyariya ceribandî bi ser ya eqlî û hisî re girtiye. Meriv dikare ekola wî bi van diyardeyên navborî, xulase bike.

Piştî vê mijara helbesta Cizîrî, bi sernavê “Melayê Cizîrî” vedigere behsa jînenîgariya wî. Di bareyê de behsa gelek çavkaniyên tarîxa heyata wî dike. Di nav van de ya Mela Ehmedê Zivingî esas digire. Lewra li gor hesabê ebcêde ku Zivingî di vê beyta jêr a Cizîrî de derxistiye holê, tarîxa jidayîkbûna wî 1570 ye:

Ji herfan mah û salê ma nehat der şiklê xalê ma

Kuca danendê halê ma sibikbaranê sahilha

Nivîskar, ji vê hêlê ve ji çavkaniyên wek Îbrahîm Tehsîn Doskî, Zeynelabidîn Zinar, Cemal Reşîd, Fewzî Reşîd jî sûd werdigire.

**Di beşa duduyan** de nivîskar nêrîna Cizîrî ya li hub û evînê tîne ziman. Di vê bareyê de dibêje ku di Cizîrî de hub di pileya herî jor de ye. Ev hêman di nav helbestên wî de noqtaya mîhraqê ye. Wî hub û evîn wek sedema çêbûn û hebûna xwe dîtiye. Loma gotiye:

Îşqa ji nûra layezal husn û cemala bêmîsal

Îsandî yelmûm û şemal dîsa xwe lê perwane da

Cizîrî hubê wek mebdeê ewwel dibîne û wek madena xulqê dinirxîne. Ew jî wekî Îbnî Erebi ji hedîsa qudsî ya ku dibêje “Ez xezîneyeke veşartî bûm. Min xwest ku ez bême keşifkirin. Min mexlûqat xuliqand da ku bême keşifkirin û naskirin” îlham girtiye û li gorî wî noqteya hereketa ji tunebûnê ya ber bi hebûnê, ji hub û evîn pêk tê. Loma Cizîrî dibêje:

Ger xeberdarî ji sirra “kuntû kenzen” guh bidêr

Da bi sed torê bweyan kit maneya lewlakê ruh

Li gor nivîskar, Cizîrî fikir û ramana xwe ya hub û evînê ji du çavkaniyan berhev û mezc kiriye. Yek Îbnî Erebi û yê din Hellacê Mensûr e.

Cizîrî hubê li ser du qisman dabeş dike. Yek; huba cismanî. Ya duduyan; huba ruhanî. Ya cismanî ya madî û suflî ye, mecazî ye. Mane û marîfeteke wê tuneye. Her wisa dewama wê jî tuneye. Lê her çiqas huba cismanî hewa be jî dibe bingeha huba ruhanî. Mîmkun e ku huba heqîqî jê bizê. Loma dibêje:

Muhbeta sûrî du qîsm e qufl û mîftah û tilism e

Hin ji ruh in hin ji cism e nar û nûr e hin hewa ye

**Di beşa sêyem a** kitêbê de nivîskar nêrîna Cizîrî ya li cemalê wek wergirtineke ji Îbnî Erebi dinirxîne. Bingeha wê jî digihîne hedîsa qudsî ya ku dibêje: “Min alem di sûretê xwe de xuliqandiyê.” Loma şairê me, cemalê wek sifetekî Xweda dibîne.

Cizîrî çawa ku hubê vedîqetîne du beşan, cemalê jî vedîqetîne du qisman. Yek; cemala ku bi aqil û hîsiyatê tê ferqkirin. Ya din; husna mutleq a îlahî ye ku bi aqil û hestan nayê fêmkirin. Loma dibêje:

Ev hûr û perî çehre but û latê cemalê

Der suretê tehqîqî Mela eynî mecaz in

**Di beşa çarem** de diyardeya mest û serxwoşiyê wek rewşeke ruhî ya Cizîrî pênase dike nivîskar. Mest û sekranî di nezera şairê me de wek semere û encameke piştî noşîna meya eşqê ye. Cizîrî rêwiyê rêya heq wek wê dilopa avê dibîne ku piştî dûrketin, geşt û gereke dirêj, dîsa vedigere û digihêje behrê. Loma dibêje:

Bade mînoşî ji dest çûme ji xwe mame mest

Qitre bi behrê gîha behir bi eynê xwe ma

**Di deşa pêncan** de nivîskar tîne ziman ku ehlê tesewufê hub û cemalê bi sekran û mestiyê ve girê didin û mezc dikin. Cizîrî jî li gor rewşê tevdigere û dibêje:

Zanim ku kohê Tûr edil lew her bi nar û nûr edil

Şhkaseya fêrfûr e dil lew mest û sekranî Mela

**Nirxandin**

**Naverok:** Naverok ji sê hêmanên esasî pêk tê ku ew di helbestên Cizîrî de cih digirin. Her wisa têkiliya van hêmanan jî wek mijara kitêbê cihekî girîng digire. Ev hêmanên ku tên nirxandin: yek; hub e, du; cemalet, sê; mestî ye.

Nivîskar van her sê hêmanên di berhema Cizîrî de nirxandine û bi nêrînên sûfîyên selefê Cizîrî re dane ber hev. Nivîskar li gor pergaleke hevgerî mijar raxistiye ber çavan. Nivîskar bi qasî tê fêhmîkirin, hakimê mijara xwe ya tesewufî ye.

**Kêmasiyên vegotinê, wateyê û rêbazê:** Nivîskar mijar zêde kin birîne û zehf neketiye hûrgilîyan. Zimanekî pir gelemperî bi kar aniye.

Ji hêla rêbazê ve jî mijar ketine nav hev du û bê pergalek û qels hatine sazîkirin. Wek mînak jînenîgariya şair di serî de nîne û piştî tehlîla helbesta şair hatiye nivîsandin. Pêşgotin piştî maqaleyekê hatiye nivîsîn. Lê pêşgotin wek navê xwe, divê pêşîya gotinê, yanî di serê kitêbê de bûya.

### Rexne

Pirtûk ji ber ku werger e û her wergerek jî ji ber ku wêrankerîyek e, yanî wêrankirinek e, kêmasiyên ziman zêde ne. Her çiqas me eslê kitêbê nedîtiye û eslê kitêbê li cem me nîne, lê ji wergerên ku ji helbestên Cizîrî hatine kirin jî tê xuyan ku wergereke hesas nehatiye kirin. Mesela wergêr têgeha “îşq”ê ya di helbesta Cizîrî de wek “sevgi/hezî” wergerandiye. Aşk/işq li ku “sevgi/hezî” li ku! Kifş e ku ev kitêb hinekî jî bûye qurbana wergêr. Wergêr hakimê lîteratura Tirkî nîne. Hakimê istilahan edebî û ilmî nîne. Di tercumeya têgeh û istilahan de zêde cesûr e. Lewra her têgeh şert nîne ku were tercumekirin. Eger têgeh di her du zimanan de, yanî di zimanê armackirî û zimanê jêder de hevpar bin, şert nîne ku bê wergerandin. Îcar têgehên edebiyata klasîk, xasma yê tesewufî. Pîraniya van têgehên jixwe di Tirkî, Kurdî, Farisî û Erebi de muşterek in û ji Erebi derbasî van zimanan bûne.

